Kultur

Mirov

Tirîfe Doskî

Jin û jiyan

Jin ji dest pêka jiyana ser vî zemînî bi keseka lawaz û tijî fêl hatiye naskirin û hatina wê bo ser duniyayê li gur efsanên aynî Êva yan Hewayê bûye egerê hindî ku Adem ji behşta xweda derkeve piştî Hewa guhdariya Eblîs kirî demê ku xweda fermana wan kirî ji dara nemiryê nexun lê dema Eblîs bi şêwey mar î şiyayî di ser da bibe êdî rûs bûn û heza sîksî li def her diwan peyda bû û sîkis encam da, lewma Hewa hate sizadan bijanên zarok bûnê û sora heyivane û Adem bi mandîbûna karî û mar jî jiherdu piyan kir û ketine erdî, êdî xwedê siza li ser hersêyan encam da. Eve bû jiblî çîroka habîl û qabîl ku dîsan jin bûye egerê kuştin û wêrankirina peywendiyan di navbera dû biran da, ev boçûnên aynî û efsaney bûne jêderek hizirî û bûne kakilka keliturek civakî, ew keliturê her hemû mirovan bi şêwekî ji nêr û mêyan çiwar çêwe diketin bi rengekê ew

xwedayê xwe ji dest bidin û êdî bibine keristek bo komelgeka daxisitî û kesayetiya xwe ya rast ji dest bidin, keliturê civakî ew ê mirovan ji arezo û soz û wîst û hizirêt ciwan dor diketin bi baweriya min a kesayetî keliturê me mirovan ji xesletên ciwaniyê dadiqute. Ji ber xwedê xwe ji dest didin û dikevine bin bandora keliturekî mirov têda ne azade ew jin û kiçên dihêne kuştin yan hereşe li ser jiyana wan heye û hizirên şiqî û hesret û xewin bûne mereqên wan, di keliturekê li ser binemayên efsaney û eşîretî û bê pirs û hizirên ebstmolojî, ev keliture bi vî away ku Hewa kirî ye nimûne bo hemû jinan têgehiştinên me yên sosolojî li ser wî binemayî ava bûne û piştî çendîn qunax derbas bûn û bizavên fîmînsitî deriketin, jin û rewşa wê û karê wê û hez û arezo û xwêndin û xewnên wî jiyana wî a xîzanî her tiştê bi jiyana wêve li ser binaxa wî keliturî dihête danan ku têda kesayetiya wê bihête çewisandin ji layê biray û bab û mam û pismam û endamên nêrên binemalê de. Tenê ewa wê desthelatê dide wan hemû kesan jî regezê wane ku (nêrin) her çend e ku nêr jî yan zelam jî bi xwe wek jinan tepeser divî keliturî de û ne azade çi zelam bi arezoya xwe xûşka xwe yan hevjîna xwe naku jî tenê ew gaveka têda yaseka keliturî û xelkek wî neçar dikin ew wê bi gulleyek yan berek yan agirekî bikuje û wan hemû rojên di gel de burandîn bi xweşî û nexweşî de jibîr bike û bi kuje, çi komelgeh li her qulaçeka duniyayê bi kuştinê û xwîn rêtinê negehiştine pileka serkeftinê di çi waran de belku layenê sosiyolojî ku layenekî here giring e di komelgehê de dipaş ve diçe û dibin bandora keliturek seqit û nemirovayetî ji hindek layane ve evro pêdivî ye li ser hemû rêkixirawên diwarê jinan de kar dikin hewil bidin jinan bi xwe ji hizirên kevin û keliturî û xeybanî rizgar bikin ji ber jin hêşta bi xwe jî li wê baweriyê ye ku jin hene xwedan şeref û jin hene bê şerefin baş e em hêşta li ser çemka şerefê bi xwe rawestin, belê şeref û her çemkeka dî pênasek û têgehştineka rehayî nîne kumelgeh bi herdu takan ve hêşta azad nebûye jin û zelam herdu heta hetayê dagîr kirin bi yasayên xeybanî û keliturî û bê hizir û zanîn û mîtudên ebstmolojî lewma pêdivî ye berî jinan pênase bikin û bikujin jinan binasin û xwe jî binasin wek xudê mirovî baş e biriyarên rehayî li ser çemik û pêkhatên jiyanê nedin taku xwe jî azad bikin